

Melle Beşîr (bê xew) : Mohammed beşîr şêx zahir Mostafa

Hatiye dinyayî sala 1927 li Bakurê kurdistanê _ Gundikê Ezîmê Navçeya Kerboran _ Wîlayete Mêrdînê

Ji sadat û Meşa'êx ê Girbenî ye

Di 4 / 10 / 1981 çû dilavaniya xwedê li Rojavayê Kurdistanê

Gundê Şebek _ Navçeya Çil axa _ Herêma Dêrika Hemko _ Wîlayata Hisêçe

û li goristane gundê Girdêmê Helîmê ya li derdora bajarê Tirbespiyê herêma Qamişlo hat bin axa kirin ,

sed hezar dilovaniye xwedê lê bê

Du 2 pirtûkên wî hatin çapkirin :

1 _Pirtûka Gaziya Belengaze li Dihokê _ Başûrê kurdistanê

2 _ Helbesta Sirûdên Nişтiman Li peytexte Komare Libnanê _ Beyrûtê

Yên ne çapkirî :

3 _Pirtûka Civata xeman

4 _Felsefa hevalê Qanûne jînê

5 _ Çîroka Jar û Bihar Evîn û Avîndr

HELBEST

SIRÛDÊN NIŞTIMAN

MELLE
BEŞÎRÊ ŞÊX ZAHIR
"BÊXEW"

MELLE
BEŞÎRÊ ŞÊX ZAHIR
"BÊXEW"

SIRÛDÊN NIŞTIMAN

HELBEST



Wellahî ta ez bimirim nakim ji bîr kurdistan

Roz û şevê bê xew bim heta herim goristan

JI BIRA RE

Hevalê min delalê min şehê min
çi dûrû hem ne nasû agehê min
Heçî tişta me çêkir tev ji derdan
gelî xort û gelî mêrxas û merdan
Me çêkir hinde zanîna xwe çend rêz
birayê ku nezanî dît bipaerz
Nezanî ger hebê aza bikin hûn
çikû nav û dilê min tev de bû xwîn



DEV ÇIRRÊN

dev çirrên û xwîn rijên
xortê kurdistan emin
Pir çelengû nav û deng
Rengê sed şêran emin
her di cenga dijminin zend û benda hildidin
em nema qet bimirin Manîû Merwan emin
Ew pilingê dev bi xwîn ku li dijmin her bi kîn
Yan mirin yanî bijîn Restemê Îran emin
Tev de mêrxas û egîd der Şîraz û Bayezîd
her bi cejin û her bi i'îd Şêrgoyê zozan emin
Kolîdar va bû ye kor mijde bê hat bo me dor .
Yan bi kuştin yan bi zor Amed û Berzan emin
pate lêxin xortê kurd tev ji bo alaya kurd

Ku ji bo daxwaza kurd Qadî û Beyran emin

SERBEST Û AZA

Serbest û aza herne serayê
da ceng û baza bidine hewayê
Pehlewanê cengê lê em bi xwe ne
Dijminê kurdistan wê ketî tayê
Her bijî her bijî kurdistan bijî
Xwîna dijminê welêt her dem birjî
lêxe lawê Restem bikuje lêxe
Dijminê kurdistan tu jê derêxe
Va roja me hilat şewqê da qelat
Tabûra kolîdar di bin erdêxe
Her bijî her bijî kurdistan bijî
xwîna dijminê welêt her dem birijî
em herne kolîdar bi cengê
kurdistana kurda çi xweş û şengê
Yam mirin yan bijîn gernas û egîd
ta hildine jorî alaya rengî
Her bijî her bijî kurdistan bijî
xwîna dujminê welêt her dem bijî

Lêxe lawê Rustem bikuje lêxe
Dijminê Kurdistan tu jê derêxe

Va roja me hilat sewqê da qelat
Tabûra kolîdar bin erdêxe

Her bijî, her bijî Kurdistan bijî
Xwîna dijminê welêt her dem birrjî

Em herne kolîdar îro bi cengê
Kurdistana kurdan çi xwes û sengî

Yan mirin yan bijîn gernas û egîd
Ta hildne jorê alaya rengî

Her bijî, her bijî Kurdistan bijî
Xwîna dijminê welêt her dem birrijî



HERNE CENGA DIJMINA

Bijîn kurdino bijîn merdino
Bi serbestû azadî ey merdino
bi tac û text û bi keyf û bi bext
bi cejin û bi dil şadî ey kurdino
Emin kurd hemî Restemê palewan
Ku berz û bilindin emin qehreman
Bi gurzû bi şîrû bi tîrû kevan
Emin Xusreû key Qubadê ciwan
Ne şerme gelo em bibin çav xewar
Ne şerme gelo em nekin kar û bar
werin da biçin em hemî ser neyar
ji nav xwe bi derxin da em kolîdar
Eve mujdebê kolîdar bûye kor
cihan her wisa ye bi derbû bi dor
Bi derxin ji dest wa cihê xwe bi zor
Bi mêranî alaya xwe bidne jor

KURDÊ BERZIN

Kurdê berzû palewanin em hemî şêr û piling
Em bi gurz û kerkidanin û di cenga çinga çing
Ey gelî kurda şiyar bin bes bikin kînê ji hev
Topê destê kolîdarî heyfa ku kurd jê birev
Bikujin sekzê kurê sekza bi roj û her bi şev
Kurdê berz û palewanin em hemî şêr û piling
Em bi gurz û kerkidanin û di cenga çinga çing
va ye Kurdistan di bakê şerme hûn mane di xew
Dor sinê Tirka bi zanin dijminê kurda ye ew
Bikujin Xurşîdê Firsê dorsinê Tirkê qelew
Lêxe ey kurdê kurê Restem bike qîrîn û tew
Kurdê berz û palewanin em hemî şêr û piling
Em bi gurz û kerkidanin û di cenga çinge çing

Nal û gurmêna metirliyoza ya hawîr bû ye şer
Na revin em can û singa xwe li ser pê didne ber
can fidakin em di vê rê de bi carek bidne ser
ta ku em dijmin ji kurdistana rengî bikne der
Kurdê berz û palewanin em hemî şêr û piling
Em bi gurz û kirkidanin û di cenga çinga çing

SED CAR BI XÊR BÊ

Sed car bi xêr bê MISTEFA BERZAN
li me xweş kirin ev geşt û seyran
Bêjên her bijî ey gelî xortan
Bijî her bijî serekê kurdan
Roja me hilat daye cîhanê
Bixêr ser çavan şêrê Berzanê
duh û du sal bûn di hizin û janê
Îro şahînet ket nav kurdistan
Minet ji Yezdan her çax û dem
ser me hilanîn derd û kul û xem
ji me re anî Key Xusrû Restem
Can me fîdaye bo te pehlewan
ew tarî şev bû li me ronî da
Ba û badev bû li me sayî da
Îro li me kirye cejn û i'îde
Sed car pîroz bê ev cejna kurdan
Sed car bi xêr bê MISTEFA BERZAN
Li me xweş kirin ev geşt û seyran
Bêjin her bijî ey gelî xortan
Bijî her bijî serekê kurdan

CAN FÎDAKIN EM HEMÎ SERBAZIN

Can fîdakin lebû kurdû welêt
Ku di cenga dijmina mil bidne hev
Em hemî serbaz û xweş mêrê ne rev
me di doza kuştiyan peymane ev
Qet nema muhlet ji bo xwînxwarê pîs
Wek Ecem Tirkên di Îran û pîs
Em hemî serbaz û xweş mêrê ne rev

me di doza kuştiyan peyman ev
Kurd û kurdistan bi hev re na mirê
Şûrê Restem ta di cenga hilgirê
Em hemî serbaz û xweş mêrê ne rev
Me di doza kuştiyan peymane ev
Dara azadî bi xwînê şîn dibê
Burc û eywan sera pê ra dibê
Em hemî serbaz û xweş mêrê ne rev
Me di doza kuştiyan peymane ev
Qet me tirsin hûn ji topê polfiroş
Polfiroş em rû ne maye e'qil û hoş
Em hemî serbaz xweşmêrê ne rev
ku di doza kuştiyan peymane ev
serê dijminê bûwe qîr û hawar
Dijminê bê bext û xain bûye jar
em hemî ser baz û xweş mêrê ne rev
Ku di doza kuştiyan peyman ev
Her bijî alaya kurdistan bijî
Her bijî kurd her tu dijmin bikujî
Em hemî serbaz û xweş mêrê ne rev
Ku di doza kuştiyan peymane ev

ZÎNDAN

Zîndan ey zîndan me be tu dil xweş
Zordarê ne zan bi dar û lêdan ser serê
kurdan me be tu dilgeş
Zîndana xaîn bê bext û bê dîn bo me
bihiştî
Kî ye dipirsê ji te ditirsê vaye te kursî
û derî şikestî
Zîndana tarî li me şiyarî bi kar û barî
Heye tu zîndan rojek bibê xan bi destê
kurdan bese neyarî
Em xortê kurdin mêrxas û merdin li te

bi derdin
Zingar û qirêj gihame ji mêj ew destê dirêj em jê xeberdin
Kî te dibînî kî te dixwînî zindana bin e'rr
Madem ku ala ji bo delala bûye mitala hem jan û hem derd
Bese kolîdar bimre tu neyar li te bû êvar
Qîra îdî lo bes bide Silo dunya her wilo bûye dor û dar
Em natirsin qet ji te bê minet ji zor û zehmet
Rabe ji nişkê her enîşkê weke mirîşkê serê te jêket
Mêr baş saxbê tev de semax bê li zor û tengî
Zordarê çepel bimrê bi dest gel ew derba zexel ne ma derengî
Divê şiyar bin bi kar û bar bin û qet me tirsin
Zîndan û lêdan kuştin û talan alaya nîşan hûn jê me tirsin

RABÛME JI SÛK

Rabûme ji sûk
diçûm Şerşebûk
Ku melek mezin
ji rengê pepûk
danişîtiye ew
li wan şeqama
Piste pista wan
bi sed miqaman
li hev dinêrin
Ew jev dipirsin
serê wan nixwîn
Û pir bi tirsin
bê pere em man
Birçî û bê nan

kesê dibînê
Digrî li ser wan
nîne di kîsik
metelekî zer
Boxwazê çayek
ji bo birader
biçûkê wan jî
Li mal zare zar
Di mane birçî
Bê kes û bê çar
Jîna me kurdan
Bi vî rengî çû
wek mîr û merdan
em ne bûn yek rû
Ez naxwazim ku
herim Şerşebûk
bibînim xortan
Di rengê pepûk

***Şerşebûk: ciheke ji bajarê Bêrûdê dikevê ser deryayê li bakurê Bêrûdêcihê ku karker li dinivin.**

NEWÊREK

Newêrek der şevên tarî bi tirs û hîzû bê zare
Di pencê rewşena rojê bi dil mêrxasê adare
ji xwe şerm û fedînakê kurê kurde di Kurdistan
Hezar sale di nav destê qirêj de pîs û naçare
binêre tu çemê xwînê ji sînga Dêrsim û Amed
Xwe tavêjê Mehabadê li Kerkûk co û cobare
xwe berdane çemê Dicle di himbêza Feratê dîn
xwe pêçane li Şengalê ku Hemrîn bû ye serkare

Şehîd û xaziyê Toros li Zaxrosê civîn danîn
Ku çav nêrin li hêviya we gelî kurdê hemî wara
Şev û ro zengilê azadî tê te guhê kurdan
Li ber çavê wa yek car rûpelê jînê ne diyare
Bi çi rengî dijîn ew yan çi ronahî çi tarîtî
Li xwe îro ne guhdare ne guhdare ne guhdare
Ji bo na çi newêrek tu newêrê ku serî hildê
Binêrê li halê Kurdistan ku namûs ketiye bin dare
Newêrek tu serî hilde ser û malê te tev çûne
Bi desta xencerê bigre li kUrdistanê haware
şev û ro bê xew û dîn be, bi mêranî here cengê
Biderxe tu welatê xwe ji dijminê hare

GAVAN

Eger gavanê garanê birastî
Biçê karê xwe û negrê bi sistî
Xebatker û dilovanê welat bê
dema ku dît ji keyfa tu mestî
ku êvaran çêlek tê û tijî şîr
Biçûkê malê hawîr dibne zincîr
Di wî çaxî ewin paşa ewin mîr
dibînê ku kebanî li ber ve beştî
şivan jî rengê gavanî bi kar bê
Şiyar bê û di destê wê de dar bî
Bi dil sojî li ber pez kar û bar bê
Her û sed car tu maçke pê û destî

Eger cotkar û karker mil bidn hev
Nivîsvar jî bi rastî ew werin tev
Sivik can bin begû şêx û nekin rev
bi gorî be ji wan re tu ji hestî
Ku pêxember wisa ferman didanî
Hemî kes werne hindava jiyanî
Gunehkara eger ku pêk neanî
Dema bê mil gerek ew baş bi westî
ne ku bo me kurda hatî ferman
Ji bo her kes dema ku hate cîhan
Di karê xwe rawestî gel dil ûcan
Azadî hingî tê û ne bi qestî
Erê bê xew dê çawa bê xewa xweş
dema rastî nebînê wek gula geş
Ne bê xew bê tenê bîna heşa reş
Li xo ke ta ne bînê tu srbestî

QEDER Û FELEK

Her kes dibîne
dido bûne yek
Ew her dû kîne
Qeder û felek
Qeder dimeşê
Ji mêj û zûve
Felek jîdûma
her dem li dûve
Dema derba xwe
danîne mirov
Bi wê kerba xwe
Paşa dikin hov
Pişik darin ew
Di xweş û nexweş
belê felek hew
bûye bexte reş Qeder tê nasîn
Ji layê rehman

Felek tê nasîn
Ji layê şeytan
Her du bi hev re
Çawa heval bin
Rehman û şeytan
Çawa yek malbin
Nizanim qeder
bûye sitem kar
Yan bê ser û ber
Felek bû zordar
Felek were bes
Ji hemîalî
Ji bo çi her kes
Ji te danalî
Dibêjine te
Ey zalim felek
Qederê wek te
kuştine gelek

Qedera bi deng
Ji nik Xudaye
Feleka bê reng
Naxwe kê daye
Qedera Xuda
Eger newê ser
Can nabê cûda
Kes nîne himber
Eger maye ew
Alema cîhan
Di pencê felek
Bûye perîşan
Naxwe karê te
Qedera serbest
Çiye ji a'lem
A'lem ji te mest
Tev çîvanokin
Qeder û felek
Bê ra û kokin

tev vir û henek
Kengîme kurdan
Kuştiye qeder
Yan me ji derdan
Felek kirye ker
Ta her dû yarbin Bo cîhanê tev
Li me neyar bin
Bi rojû bi şev
Feleka reben
Qedera Xuda
Bûne dar û ben
Li jor û e'rda
Felek û qeder
Li ber me bê çek
Dema li hember
Ku em bibin yek
Dema bibin yek
Û tev li kar bin
Qedr û felek

Çawa neyar bin
Doza we çiye
Li feleka kor
Ma kes dîtiye
Ew qedera jor
Naxwe tu bê xew
Nebêje felek
Bi nalîn û tew
Ka burcên belek
Nebêjin qeder
Çima tu arî
Te em kirin ger
Ji bo me harî
Lê bake kuerdan
Werin bibin yek
Wek mîr û merdan
Gokê bibin şek

HEÇÎ JÎNA

Heçîjîna di bin destê neyra de
Bila ew jîn biçê îdînemînê
Wekîkurmê di nava qoçe dar de
Di nava agirîdikşînê şînê
Zivistana şevên tarîû dirêjin
Civatokê me gal ' gala dirêjin
Hawîrîagir zincîrin dibêjin
bûrîqey çû ji welatê Mardînê
Bûrî qey çû ji nav destê kufara
Bi dûr ket çû bi qûnaxan hezara
Siwarê wî U'mer ji hemî siwara
Bi ro giha nava Mekhû Medînê
Çivanokê kelîne bê binîne
Ser û bingeh ji wan re kes ne dîne
Belê rewşa def û xiştê sofîne
Rengê êzgeh li dar qesra şîrînê

Eger raste tu lawê kurdistanî
Tu nas dikê wîRistemê Îranê
Li hember wîmêrxas nebûn tu zanî
Cîhan seranser nas dikê dibînê
Ji bo Ristem çima tu lal û gêjê
Palewaniya Ristem kirînabêjî
nayê guh te dengê dijmin hêjî
Bûrîqey bo te dijmin na şikînê
Bese kurê kurdan di xew tu mayî
Li benda çîrokê şêx û malayî
Yan li benda nanê beg û axayî
Bese îdî divê bê xew bimînê

kovana



EGER RASTÎ WERE DERVE

Eger rastî werê derve ji layê te tu ajarî
Di çavên reng mirûvan de neyra û sed gunehbarî
Dema rastî vêşêrê tu ziman xweş xape ger bêtu
Li nik wan reng mirovan her delalû rind û serdarî
Ji destpêkêxwe rabêçe were hinda va maldaran
kufir nabin heta ku ew nebin serdarê maldarî
Nîşan daye Xuda bo me di Furqanû di Ayatê

Çima ya rast veşêrin em belengazan bikin parî
Belngaz kufletê yezdane çawa ku xwedê gotî
Sitemkarî di şere'êde kesî ne dî ye li vî warî
Belengzê belengazane ew kurdê di bin destan
Heta kengî tu bindest bê gelî kurd her tu yî arî
Di destêFursû Toranî pêxwês wan şivanoka
Beg û axa û maldarê te ne kurdo diçin arî
Ji dijmin re fidakarin ji bo te pîsû xwînxwarin
Ji lew em bêxewû dînin şevû rojan dikin zarî



ÇENDÊ ÇEND SALE

Çendê çend sala ku mam li şebek
Bi xweşû şîranî û keyfû henek
Bi cilû cawo geşû nie'metû nan
Bi biratî gerû gavan û kulek
Mẹ digot raste ji dil em diçinê
Me nizanî bû daxwaz tovê tenek
Bi temamî me divêe'lba xwe sax
Hingî tu padîşahê birca belek
Ger bi vî rengî nekê tu bi me re
Tu nehêjayî bi pîvaz û pelek
Ku telîs bistû yekin wek me tune
Pîsû palasin ku jêkêm bêhinek
pa dikin wan kesên ku rastû durist
xwe biparêzin ji cotkarê ŞEBEK



ŞÎNA BERZANÎ(1)

Dilpêtû piringa û ceger dojeha agir
Sirra di dilê milletê kurdî de pipêjin
wer têbigihin şêxû mella xweda sirr
Keşkûlê vekin ronikê çavên xwe birêjin
Ka serwerê kurdan malik û heykela Zaxros
Ma kî wê bixwînê ji me re deftera nûroz
dil rabe here bê jê xuda ma te çiye doz
Kîna te ji zûda heye derbê te ji mêjin
Bo çi bi gefî tu li me ey Yezdanê gewre
Qirdê me çi kûre li me her bahozû e'wre
Bêbexte felek dîsa li me çep daye dewre

BERZANÎ xuya nakê felek bo te çi bêjin
Kawayême ye dîsa di kee'bêde ye bêşik
Mizgift û Kenişte xwe bi nasin wekî Mezdik
Dînê bê guh û çav û serî bo çi dikêrik
Qiblet me ew dîse ma em tev ker û gêjin
Dîsa rû bidin mescid el ehram û ne razên
Dakefte perist û xwînmijêkurda bi kazin
Em hatine bihtin ji me îdî çi dixwazin
Bêxew bese ev mesele pirr dûrû dirêjin

ŞÎNA BERZANÎ(2)

Bi kovana dilo bêje goristan
Hejar bûne gulê baxê gulistan
Girêdin kurdino dîsa reşa xwe
Bila bigrîn kuta bê dibîstan
Serok Berzanî şêrêguh û cenga
Mixabin nayê dengê te ji denga
Dilo em man nîşana top û tenga
Li me kir bûn meha adar û nîsan
Xuda me ev çi bû dîsa neyarî
Ji jêrû jor li me agir dibarî
Di cîhan de tenê da me hejarî
Te reş hişte li ser xakême kurdan
Ji bo kurdan felek herdem tu korî
li dora me timû tim çep diborî

Xuda bo me tenê tu xort û zorî
Li ser me herdikê e'wr û zivistan
Felek mala te nava sed hezar car
Te em hiştin hejarû dil birindar
Ka BERZANÎ KAWAYÊ kurdû serdar
Felek nîne li te bextêtu însan
Belêzordarêpîs dilxweş nemîne
warê Berzanî warek şengû şîne
Bi dû çavên xwe têderba bibîne
Ji destêkurdû şoreşgêrê BERZAN



DÛRE DESTÎ

Dûre destî mirina çendî ku saxin der cîhan
Saxiya bêdîtina feyda xwe nîne ew jiyan
Xizmû mirhovêhevin em yan çi bav û çi bira
Roj li me tarî şevin ku dûra qinyata dilan
Hin li jêrin hin jorin tev di nav pencê neyar
Qîre qîrû gaziya dengêji dûr naçê guhan
dijmina davik vedane sed hezar şewk

û şebek
Rast û çep rêgirtine masî kete behra xeman
Ma dema em dûre destin û bi vî rengî dijîn
Raste em tev mirîne gewdekên bê-deng û can
Bêxewin lewra şev û rojan dinalin dil bi kul
Piste pist karek tunîne çi bikin derdê giran

NAVEROK

JI BIRA RE	5
DEV ÇIRRÊN	7
SERBEST ÛAZA	8
EM KURDIN	9
HERNE ÇENGA DIJMINA	11
KURDÊ BERZIN	12
SED CAR BI XÊR BÊ	14
CAN FÎDAKIN EM HEMÎ	15
SERBAZAN	
ZINDAN	17
RABÛME JI SÛK	19
NIWÊREK	21
GAVAN	23
QEDER Û FELEK	26
HEÇÎ JÎNA	32
EGER RASTÎ	35
ÇENDÊ ÇEND SALA	38
ŞÎNA BERZANÎ 1	40
ŞÎNA BERZANÎ 2	43
DÛR DESTÎ	46

ÇENDÊ ÇEND SALE

Çendê çend sala ku mam li şebek
Bi xweşû şîranî û keyfû henek
Bi cilû cawo geşû nie'metû nan
Bi biratî gerû gavan û kulek
Me digot raste ji dil em diçinê
Me nizanî bû daxwaz tovê tenek
Bi temamî me divêe'lba xwe sax

Hingî tu padîşahê birca belek
Ger bi vî rengî nekê tu bi me re
Tu nehêjayî bi pîvaz û pelek
Ku telîs bistû yekin wek me tune
Pîsû palasin ku jêkêm bêhinek
pa dikin wan kesên ku rastû durist
xwe biparêzin ji cotkarê

ŞEBEK

ASO

Lebanon / Beirout, P.O. Box: (113/5685)